

Di himbêza



Bivz

Dareka ne gelek sitûr û pîta û tûvil hulî û belg wekî hêkan û lêv bi didanok e. Ji (10) mêtaran bilindir dibe. Kuşîlk kesk û rîşelokin û berî belgan derdikevin. Rihên wê axê qelew diken û erdî vediken û sist û xweş diken. Ev dare li Kurdistanê bi qetlazî li cihêن ter û li ber lêvên avan şîn dibe. Darê wê bi kêr tiraşinê nahêt û ji ber ku yê sêvik e û bi tenê bo pejanan û sotinê baş e.

Kuwîzîrk; Ezmangak



Jingeh: Li erdê deşt û rastgehî û ber lêvên rîkan û heta bilindahîya (1800) mêtaran şîn dibe.

Nışan: Giy ayeke salane ye. (20 - 60) sentimêtaran bejnê dike. Belg zivr û sertij û bê bistik û bi qurmîçkin. Kuşîkên wî biçûk û komkome wekî oyşikan bi sergupkên takâ vene. Rengê wan şînekî bi ser esmanî veye. Giy ayeke hêj kuşîlk nedayn anku serê bihar ê kelandî û zer kîrî tê xwarin û bo dermanan jî li kare bi taybetî kuşîlk û şîrava belgan û bistik.

suruştî da...

Qurt , kurt .



Kelwaş: 95 -105 sentimêttran
dirêj e.

Nışan: Balnideyekê goştxwere.
Bara pitir gewrekî bi ser qehw-
eyî veye. çeng pan û dirêjin. Kuri
bavreş û kurt û çarkujike. Çav
qehweyi ne . Nikil risasi ye. Pê
reng xwelikî ne.

Jingeh: Li nav çiyayan dije.

Zêdebûn: Hêliha xwe li nav
çiyayan, di zinar û rizdeyan re
çê dike. Ya mê bara pitir hêkekê
bi tinê dike, ew jî sipîyekê sade
ye.

Xwarin: Xwarina wî bara pitir
kelexên mirarin.



Fistîk

Kelewaş: Piçekê ji c urdî mez intir û
bi qelaf etir û dir êjtir e.

Nışan: Ji binemala Kûjkî ye. Reng
qehweyi û zerekî têkel e û serê wî
sipî û qehw ayî û zerekî dirêjok û
biç ûke. Dest û pê kurtin. Girane bo
rêv eçûnê. Demê mirov nêzîk dibe
bêneka genî ji xwe ber dide.

Jingeh:

Bi qetlazî li deştan û di kunêñ wekî
yêñ curdan ve dije û hinek caran
xw e nêzîk avahîyan jî dike.



Zêdebûn:

Gunêla wan serê
biharê ye û ya mî
nêzîk du heyvan
aviz dimîne. Demê
dizêt ji (3 - 5)
têjkan dibe.

Xwarin:

Goştxwer e û
xwarina wî bara pitir
goşte çûçkû mişkû
curdan e.

Min nedizanî!

- Gapling(zerafe) her du salan têjikekê dike.
- Sivore her sal (2 - 5) têjkan dike.
- Curd her salê duwazde caran dizêt û her carê ji (2 - 22) têjkan dike.
- Têjê filî (22) heyvan dimîne di zikê makêde û yê
hesp û mahînan (336) rojan, û yê keran (150 - 180)
rojan, û yê hêştiran(315)rojan, û yê şer û pilnigan
(107) rojan, û yê seyan (64) rojan..

